

9. Gerek ligel Braudel –Brodil di Mêjûwa Firensa de:

F. Braudel, mîna ku li ser wî de hatiyê gotin, Qurmê Nifşê Duewem ji Dubusta Analî bû. Ew pir di Cîhanê de ji ber pirbûna Berkirina wî û kûrbûna Dîtina wî hate binavûbangkirin. Ji Nivîsandinêni wîyî bi nerx ve "Derya Sipîyî Navînî û Cîhana wê der Pêla Filipê Duwem de¹" di çend Bergan² de tête dîtin, ya ku ew bi Danava Nameya Doktotara wî ve dihate dîtin. Vê Nivista hanê ji xwe re nav û bangeke Cîhanî date wergirtin û ew çend carî hate çapkîrin yanjî jê çend xelekên pir û di bin Nav û Nîşanêni cudan de hatin çapkîrin³. Herwehajî Nivîsandinêni wîna mina zincîrekê di Telefizyonê de li ser Ferhenga Deşta vê Deryê de û herwehajî ew ji bona pir Bernameyên Radyoyiyi Zanyarî bûn. Ji Nivîsandinêni wî "Ferhenga Metiryalî, Abûrî û Sermeyedarî" tête dîtin, ya ku ew der Sala 1976 de di Sê Bergan de hatiye belavkirin⁴.

Praudel nala Danînvanêni Dubusta Analî Mark Blox û Lusyan Fibver wan dixwestin, ku ew (Synthèse) Suwarkirina Mêjûwê li paş Lîvenerandinê de pê bêtîin rabûn, angu ku ew Lînerîneke tevayî yanjî bi carekê ve ji bona Mêjê bidin derxistin, piştî ku ew wê bi Şaqûlî ve ji bona Deman û bi panayî ve ji bona Waran û Hereman bidin pirtptirkirin. –Ev jî bi cudabûna Nifşê Sêyemî dihate kirin, yê ku wî xwe bi Xwendekariya Tengalkirinan de bi rengekî bi serê xwe ve û bi bê guihdan bi lînerîneke giştî ve dida kirin. Wer bi vî rengê hane ve Mêjûwa nala Mêjûwan û pirtptirkiana dihate derkevtin.

Li paş ku ew ji bona esmanêni Derya Sipîyî Naverast de hate perwazkirin û wî bi dûrbîneke "Dema Dûr" ve li Ferhengên wê de date temaşekirin, Praudel li bereveçûna Jîyana Abûriyî Cîhanî û lidûhevhatina Şapên wêyî Navdewletî de û li Rê û Bahnêni Deryayî ve di nava pêleke dirêj de date temaşekirin.

Der Sala 1986 de, gava ku ew di Temenê xweyî Heştêuçar Salî de û ew di berzbûna karnasîya xwe de dihate dîtin, ew careke din ji bona lînerîna Mêjûwa Welatê xwe hate vegerandin. Wî Bergê Yekem ji Zincîrekê di bin Navnîşa giştî de "L'identité de la France" – Naşîna Firensa –Nexweyîtiya Wêna" date belavkirin. Wê ev Bergê hanê ji bona xwendekariya "Cih û Mêjûwê" date tirxankirin⁵. Cih bi wê Têgihiştina Ciyoğrafi û

¹Filipê Duwem ji Sala 1180 tanî Sala 1223 bi Padışahê Firensa ve dihate dîtin. Ew bi navê Ph. Auguste dihate nasîn. Wî Serradana Xaçperestiya Sêyem ligel Richard Coeur de Lion –Rîşardê Dilêşîr date serdarikirin. Ew ligel Selah El-Dînî Eyubî de bi şer ve hatin kevtin. Ismet Şerif Vanlı

²Ew bi Zimanê Firensi ve "La Méditerranée et la monde méditerranén à l'époque de Philippe II", Paris 1949. Ismet Şerif Vanlı

³" La Méditerranée: Espace et histoire, Paris 1985" –Derya Sipî: Cih û Mêjû. Jî ji "La Méditerranée: Les Hommes e'héritage, Paris 1986" –Derya Sipî: Merov û Lidûmayînîn wî. Ismet Şerif Vanlı

⁴ Bi Zimanê Firensi: "Civilisation inaténîelle, e'conomie et capitalisme" Ismet Şerif Vanlı

⁵Fernand Braudel: "L'identité de la France: Espace et histoire" – Nasîna Firensa: Cih û Mêjû, Paris 1986de, (Bergê Yekem di 386 Rûpelan de). Ismet Şerif Vanlı

Pêwendîyên wêyî tevlihevî ve ligel Mêja Dûr û Nêzik de tête derkevtin. Wî bi pêşgotineke giştî ve ji bona her Çar Bergên Zincirê ve date destpêkirin. Wî tête remana xwe di çawabûna nivîsandina wêna de date diyarkirin û wî date bibîxistin, ku Bergê Duwem di bina Navnîşana: "Nasîna Firensa: Mirov û Tiş" (li ser Tûde, Abûriya Siyasi û çawabûna Neşnîvanîya Mirov li ser Zemîna wêna de û bê ka wan çilo û çawan ew didan çewisandin). Bergê Sêyem wî di bin Navnîşana: "Nasîna Firensa de: Dewlet, Zanyarî û Civak" de date nivîsandin. Bergê Çarem wî di bin Navnîşana : "Nasîna Ferensa de: Ferensa li derî Firensa de" date nivîsandin. (Wî ew bi Tegihiştina Pêwendîyên Firensa ligel mayînên dinî Ewropa û Cihane de, lê ne bi Tegihiştina Diplomasî ve belam bi têghihiştina Jîyanî ve date nivîsandin).

Mêjûwa Firensa di vê Zincîrana hanê de, mîna ku wî navroka wêna di Pêşgotina xwe de dayite derxistin, ji tevaya nivîsandinê wî di vê Danava hanê de, -yên ku ew pirî pirbûn-, tête cudakirin. Merov dikare vî karê hanê bi "Gerekê ve di kûrbûnana de" û bi lênerînekê ve ji bona Mêjî "ji nava cerk û hinavan" bide pesinandin, ya ku tête Heyamên dûr û nêzik û herwehajî pêrejî dema Nihajî têtin tevlihevkirin û ji wan Mêjû di nava Jîna her Heremekê de, her Gundekî de, her Bajarekî de, li ser Rê û Banan de, di nava Daristanan û Kenarêن Çeman de heyamekî li dû heyamekî de di hilat û dahatîya timî de di navbera Mêjê û Niha de tête pêkhatin.

Hevrêya ligel Braudel -Brodel de di vê gera wî de ji bona nava cerg û hinavêñ Welatê wî ji bona derxistina Mêjûwa wî ji ditina rûwê wêyî cudan di Heremên wê de, di Demên wê de û di Şêweyên Jîyana wê de ev bi xwe jî ve Hibûneke biçianî di "Mêjûwa Nuh" de dide derxistin û bê ka çawan Merov dikare Yekitiya Netewe bide derxistin. -Evaya Danava Lêkolandinê bû, ya ku ew ji gewdeyên wêyî pirtpirtkirinê di nava warêñ Demê û Cih de dihate pêkhatin û ya ku ew di kirina xwe de ligel Ewropa mayî de di berveçûn û vekişandina xwe de û di kirina Hişkatîyê de ligel Cihanê de dihate dîtin.

Dê ev Hînbûna hanê pir bi zengînî ve bête dîtin. Ez dê peyvê ji bona Danervanê Nivistê bidim hiştin, mîna ku wî xêzên xwe di pêşgotina xwe de dane diyarkirin. Ez dê kurtbûnê bidim girtin, heger ew hate pewistkirin û ez dê hinekî bidim darêjîtin, heger min date dîtin, ku evaya ji bona Xwendevanê Rojhilaşî û bi teybeti ve ji bona Xwendevanê Kurdî dide divakirin. Debera em bi vê gera xwe ve ligel wî Mirovî de bêtin rabûn, yê ku wî gewretirîn têgihiştin ji bona "Mêjûwa Nuh" û ji bona Mêjûwa şerîntirîn Welat ji bona berdilê wî: ji bona Welatê xwe dayite dan.

Braudel dide gotin, ku ew dê Mêjûwa Firensa wer bide ezmonekirin, ku ew nemîna Welatê wî bête dîtin. Ew dê bes û bi tenha ve dê xwe bi rola "Çavdêrê" bêlayî ve li gora karînê de bide têrkirin. Firensa jê re ji dûr ve di Nivistêñ wîyî berê de li ser Derya Sipiyî Naverast de yanjî li ser Sermiyandarîyê de hatibû dîtin. Ew jê re nala Rastiyekê di nava Rastiyêñ din de dihate dîtin. Ew bi bextiyar ve dida dîtin, ku ew careke din ji bona Mala xwe (Welatê) hate vegerandin. Rola Çavdêr dide divakirin, ku ew xwe ji her mîldarîyekê û dildarîyekê bide rûtûqûtkirin. Rût û qûtkirina Mirov ji dildarîya beramberî Welêt ve bi karekî pir dujwar ve tête dîtin. H.Taine -Têñ¹ Mêjûvanê berî wî xwe ji vê dildarîyê nikarîbû bide rizgarkirin, tevî ku bawerîya wî jî bi servajîyê vê jî dihate dîtin. Belam Ch. Tocqueville -Tokvili dikarîbn xwe di Nivista xwe de li ser "Pêla Padışahî û Şûreşa Firensî de" jî wê dildarîyê bide

¹H. Taine der Sala 1893 hatîye jîyandin. Wî Nivista "Zinetêñ Firensa di Serdema Nuh" date nivîsandin. Braudel ji bona vê Nivistê dide nîşandan. Ismet Şerif Vanlı

rizgarkirin¹. Herwehajî ew navê Mêjûvanê din dide jimartin, ji yên ku wan li ser Mêjûwa Firensî de ji Sedsalê Şanzdehan de dane nivîsandin. Di nava van Mêjûvanan de G. Corrozet, R. Gaoguin, J. Michelet² têtin dîtin. J. Michlet ji Mêjûvanê Sedsalê Nozdehan de tête dîtin, ji yê ku hêjî tanî niha jî Nivistên wî têtin xwendin. Ew ji bona Remanê Şûreşa Ferensî û Bîr û Bawerîyêñ Komarî Berxwedanvanekî pirî zana bû. Wî her û her dida dubarekirin, ku Tudeyêñ Heremêñ Ilzas û Lorin (Herema Strasburg) "ew bi Vîna xwe ve Firensî têtin dîtin", di gava ku Mêjûvanî Elmanî Treitschke –Tratşkê dida dubarekirin" ku ew tevî Vîna xwe jî bi Elmanî ve têtin dîtin". (Divê li vêderê de bête zanîn, ku Tudeyêñ wan Hereman di jîyana xweyî rojî de bi Zimanê Elmanî ve dihatin axivtin û wan di Dubistanan de Zimanê Firensî ji xwe re didan xwendin). Ji wan Mêjûvanan jî Lavisse, Curties, (yê ku ew Elman bû), Covaiguac û hinêñ din jî dihatin dîtin. Magelo çîma Braudel xwest, ku ew navê xwe jî bi ser vê lîsta dirêjî Mêjûvanan bide vekirin? Bersiva wî li ser vê pîrsê de wer dihate dîtin, "da ku ew Mêjûwa Firensa ji nava wan dîwaran bide derxistin, ji yên ku ew li dor û berêñ wê de hatine hildan", ango ku dê Mêjûwa wî ji Mêjûwêñ berî xwe ve bête cudakirin.

Dê ew dîwaran bide vekirin û dê ew Ronahîyêñ nuh ji bona ser mîjûwa Firensî bi xistina Zanistiyêñ nuh û Şêweyêñ wan ve ji bona ser Danavêñ Lêkolandinê bide avêtin. Ev Zanistiyêñ nuh di van Beran de têtin dîtin: Ciyografya, Abûriya Siyasî, Zanistîya Demografi –Tudeyî, Zanistîya Anthropologie –Mirovanî, Etnologî, Zanistîya Civakî, Zanistîya Rewansinasiyî Tevayî û Xwendekariyêñ Zanyarî.

Heger Mêjûvan ji xwe re date xwestin, ku ew Mêjûwê li ser ronahîya van hemû Zanistîyan de ji xwe re bide xwenedekarikirin, dê ew xwe di nava kûrbûnan de bide dîtin, ku ew tevan bi başî ve nade naskirin. Dibe, ku ronahîya van Zanistîyan encaman bidin derxistin, ku dilnêñ pê têtin nexweşkirin. Dê ew bidin dîtin, ku Yekitîya Firensa ne ji Pêla Jeanne D'Ark –Can Dark³ dayite destpêkirin, nejî ew Sed der Sed ligel Şûreşa Firensî de hatîye destpêkirin; belam ew bi vekirina Şîvîn Hesînî û Dibustanan ve hatîye pêkhatin. Hegerjî Şûreşa Firensî peqandina pêşiyî Netewê Firensî bû, belam gotina "nationalisme" – Nationalismus– Milibûn bes û bi tenha ve di nava Nivistên Balzac –Bakzak⁴ de (ango di Sedsalê Nozdehan de hate peydakirin. Netewe ne nala "Kesekî" tête dîtin, mîna ku Michelet jê re dide bangkirin. Belam ew "Komeke ji Rastîyan û ji Kesan tête dîtin, yên ku ew bi rastî ve hatine jîyandin û ew li ser Temâşegeha Mêjûwa Dema Kurt de Sal bi Sal ve, În bi În ve û Roj bi Roj ve nehatine peydakirin. Ev Mêjûwa ku em li ser Depêñ Xwendinê de pê têtin

¹Ch. Tocqueville ji Sala 1805 tanî Sala 1859 de hatîye jîyandin. Ew tanî niha jî ji Gewretirîn Feylesufen Mêjûwê û Karnasen di Zanistîya Siyasî de tête dîtin. Ismet Şerif Vanlı

²J. Michelet ji Sala 1798 tanî Sala 1874 de hatîye jîyandin. Ismet Şerif Vanlı

³Jeanne D'Ark Keçeye Gundî bû. Ew ji Sala 1412 tanî 1431 hate jîyandin. Dî vê Pêlê de Ingilistanê bi yarmetîya Mîrê Herema Bourgogue –Burgund Beşek ji Xakê Firensa dabû layandin.

Can Dark "Dengek" datebihistin, ku ji bona wê dide bangkirin, da ku ew Firensa ji Layandinê bide rizgarkirin. Wê ji Padşahê Firensa Şarlê Heftemin date xwestin, ku ew Supahekî ji bona wê bide dan, da ku ew pê sérê Ingilizan bide kirin. Şarlê Heftemin Supahek ji bona wê date pêşkeşkirin û wê sérê Ingilizan date kirin. Ew bi Dîlî ve ji bona nava desten Ingilizan hate kevtin. Ingilizan ew ji bona ber Dadgehê datin pêşkeşkirin û wan ew bi Mirina şûstandinê ve bi twankariya Canbazîyê ve dane dadgehkirin. Ew di nava pêtén agir de hate mirin. Ew ji Pêla Şûreşa Firensî de nala Nimûneya Welactperweryê û Evsanê tête derkevtin. (Belgeyêñ Dadkirina wêna û Gifûgoyêñ Civînen

⁴Balzac –Balzak Nivîsvanekî di Sedsalê Nozedehan de pir bi nav û bang bû. Ismet Şerif Vanlı

fêrkirin". "Mêjûwa Firensa di Dema Dûri dûr de hatîye neqîşandin û ew ji Kombûna Tiştan di derbasbûna Heyaman de hatîye pêkhatin".

Tistê ku Merov dikare lê rexne li nik Mêjûvanan de bide girtin, ji yên ku navê wan hatine gotin, " di Bawerîyan wan de tête dîtin; ji ber ku ew didin bawerikirin, ku Mêjûwa Firensa ji Sedsalê Heştdehan de di Pêla Şiyarvanan de yanjî ligel nobûna Şûreşa Firensî dehatîye destpêkirin. Wan ev Şûreşa hanê bi Incilekê ve datin danîn û wan ew bi Kaniyeke Êdyologî ve ji bona lêvegerandinê datin danin. Me bi wê Incilê ve dida bawerkirin, gava ku em hêjî Menal bûn. Ez dijî vê Bawermendiyê hanê tûrebûna xwe didim derxistin. Ez pê nayêm rûniştin, ku Mirov Tiştan bi sîwanekê ji mezînbûna Êdyologî ve li paş bûyîna wan de bide dorhêlkirin. Herwehajî ez bi parvekirina demî ve nayêtin rûniştin, ya ku ew vê mezibûna hanê: bi Dema Kevnar (ango Padîşahîyê) û Dema Şûreşê ve pê didin girêdan".

Braudel pêde diçe: "tiştê ku divê pesendana wîna li ser Ferşê Lêkolandinê de ew bi xwe ve Buhayê Mêja Firensa bi carakê ve ji berî vekirina Romanî ji bona Welatê Galî de û tanî vê roja me jî bête dîtin û bê ka çi van Heyamên hanê jî dikirinê ligel hevdû de dane kîrin. Di Pêla Liwîsê Şazdehemîn de, (yê ku ew ji bal Şûreşê de hate bidarvekirin), Firensa "Xatûneke Perixî" bû. Divê bête gotin, "ku Mêjû û Berî Mêjûwê Du alîyan ji Yek cûnê didin pêkanîn û Gundêñ Gundîtiya Firensî li ser Zemîna me de ji Sê Hezar Salêñ Berî Zayînê de hatine neqîşandin. Welat Galî ew War bû, yê ku li ser wî de hate lihevhatin, ku Firensa li ser wî de li paş Heyaman de bête mezinkirin. Derbasbûna hinekan ji Eşirêñ Germanî di ser Çemê Rayin de di Sedsalê Pêncemînî Zayînê de hêjî nala bûyînekê tête derkevtin, ku em di nana dûvikên wê de hêjî tanî vê rojê jî têtin jîyandin. Evayajî di parvekirina Belcîka de ji bona Du Heremên Zimaniyî cudan tête derkevtin". Na hêj bêtir "Xwîna me Bînvanîyê li ser bûyîna "Pelemarêñ Berî" de li ser Zemîna me de ji kevnar de dide dan".

Ji alîyî vepanbûna Zemînê de "divê "Şesparsûwê" Firensî (ango Zemîna Firensiyî niha)¹ ne mîna pîvana bi tenha xwe ve ji bona warê Lêkolandinê bête dîtin". Merov dizane, "ku di bin endazê Şesparsûwê Firensî de hin ji Hereman û Melbendar têtin dîtin, ku her Yek ji wan bi Jîneneke xweyî Ewtonomiyî taybetî ve tête jîyandin. Herwehajî di ser Şesparsûwê Zemîna Firensî de Ewropa tête ditin û Cîhan jî di ser ewropa de tête dîtin".

Bi rasti jî ve Merov nikare "Mêjûwa Ewropa û Cîhanê jî ji Mêjûwa Firensa bide cudakirin. Dibe, ku Mêjûwa Eropa û Cîhanê rê li me de dabe tengkirin, dibe, ku ew jî rojekê ji rojan jî me bide nabûdkirin. Belam magelo em her tim bewramberi mêjûwa wan bê guneh bûn?". Yekekî dayite gotin: "ku Serbilindaya Miletêñ Nuhî Bajarvanî di wir de tête dîtin, ku wan Mêjwûa Cîhanî dane derxistin".

Belam "Peyivandina divayî di navbera her Neteweyekî û Cîhanê de wergirtin yanjî hilanîna Mêjûwa wî nade liberxistin. Belê têkelbûn di wê peyivandin divayî de û ne tevlihevbûn û hevgirtibûn têtin dîtin".

Wisa "li ser Dema dirêj de ji bona Firensa, Ewropa û Cîhanê de, ya ku ew bi dûrbûna xweyî Demî û Esmanî ve tête derkevtin, dê Lêkolandin li ser wê de bête kirin. Çûn û hatina min di nava Beramberkirinan. Serpêhatiyan û Nivistan de dê min ji bona nava Demê û Cîh de bide ajotin. Mebesta min ji van serpehatiyan "bi derxistina Beran û Mêldarîyan û ne derxistina "Qanûnmendiyê" tête dîtin, yên ku ew ji vê Mêjûwa hanê Xwendekarıya Mêjûwa Civake didin kirin".

"Ji Deryekî ji bona Deryekî din ez dê bidim karkirin, ku ez dê li tevaya Mêjûwa

¹"Şesparsû" bi Zimane Firensî ve Hexagone tête gotin. Ew rengê Endaziyî vepanîyî Şesparsûwî tête derkevtin. Neqsa Firensiyî Niha nala "Şesparsû" tête derkevtin û bi vê têgîhiştina hanê jî "Şesparsû" jê re tête gotin, ya ku ew bi nişana Firensa tête derkevtin, (mîna ku Merov ji "Potûnê" re bi nişana Italia ve dide gotin). Ismet Şerif Vanlı

Firensa de li ser Ronahîyên lidûhevdûyî de ji Zanistîyên Civakîyî cudan de ji Ciyografya, Intropologî, Demografi, Abûriya Siyasî, Zanistîyên Siyasî angó Politologiu –Politologî, Xwendekarîyên Zanyariyan û Rewanşinasîyan bidim temaşekirin, yên ku em dikarîn ji wan re Culturologie –Kuturologî, Zanistîya Civakî û herwehajî Pêwendîyên Navdewletî, ji ber ku dê Firensa li derveyî Mala xwe de bête dîtin, bidin binavkirin. – Dê Erkê min giring û sengîn bête dîtin... Zanistîya Mêjûyî bi serêxwe ve beramber Mêjê tête dîtin. Belam pir Zanistîyên Civakîyî din ji bona ezmonkirina Niha têtin dîtin... Ez dê xwe ji bona dubarekiranê bi neçar ve bidim dîtin; ji ber ku Merov nikarê Mêjûwê di nava Pilaneke nişankirî de ji serî ve bide xistin. Di her Deryekî Mêjûwa Mêjûwa Firensî bi tevaya xwe ve li te dide temaşekirin. Herger ku ez li ser Heremeke Ciyografi de bihatame axivtin, magelo dê ez çawa xwe ji ezmonkirina vê Herema hanê li ser ronahîya Abûri, Siyasî, Zanstîya Civakî, Intropologî ûhd. bidim rizgarkirin? Bi vî rengê hanê vê dê ev Herema hanê, ya ku Merov divê Mêjûwa wê bide ronahikirin, nala Yekitiyeke Heyî bi serêxwe ve bête kirin".

"Herwehajî dujwarîyeke din jî û nemaze ji bona Xwendevan tête dîtin; jibervêjî ez xwe neçar didim dîtin, ku ez divê xwe di her gavekê de di nava Heyaman de, di nava Mêja dûrî dûr de, di nava Dema Dûr û nêzîk de û di nava Serdema Niha de bidin veguhestin. Heger ku Mêj jî ji Niha bi bergiran, bi caran, bi çîyan, tiraş û newalan ve bête cudakirin, belam ew dikare bi me ve di rê, newal û cuhukên xwe de bête gihaştin. Mêj di dorhêla me de di nava ba de tête dîtin. Em ligel wê de dijîn, bêyî ku em wê bidin hestkirin... Ez dê bidim karkirin, da ku ez livandinên dûrbûna kûrbûna Mêja Firensî û lidûhevhatinê wêna bidim dozandin, da ku ez wê bidim dîtin, bê ka ew çawa ji bona nava Niha tête kevtin, mîna ku Çem ji bona nav Derya têtin kevtin".

"Magelo ez di helbijartina Navnîşana Nivistê de "Nasîna Firensî" bisekevtî bûm? Belê ev navê hanê bi dilê min bû, belam têde çend Salan berî biryara xwe ez dudîlî bûm. Ev navê hanê bi xwe jî ve tevaya pirsan dide derxistin, ji yên ku li ser wan de hatîye axivtin û ew pirsên din jî û remanên din jî bi ser de dide vexistin".

"Magelo Nasîna Firensa kanî çi ye?, heger ku ew bi Pirsiyarîyeke Bingehî û Navînî ve neyête derkevtin û Firensa pişta xwe bi xwe ve nede girêdan? Ev hebûna Jîndarî ji anîna Mêja bêsinor bi bînferehbûneke dirêj ve ji qatên lidûhev de hatîye pêkhatinyên, ji yên ku ew li ser hev de hatine komkirin, mîna ku ji kevtinê Deryayî pêçen Qaşîlê Zemînê di derbasbûna Heyaman de têtin afirandin. Nasîn ew mayîn bi xwe ye. Ew ji kevtinê kirinê kombûnê, tevlihevbûnê û têkdanê tête derkevtin. Ew bi pevcûna Mirov bi dijî xwe ve tête derkevtin, da ku ew bête hiştin. Heger ku pevcûn hate rawestandin, dê her tişt bête herifandin. Netewek nala Neteweyekî nayête dîtin, heger ku ew bi bê birîn ve lidûxwe de nede girin...û heger ku ew di rê bi hezaran ji Bawermendîyan, Mêtologîyan, Cêm û Rûbaran û Nigaşan ve xwe bi xwe ve nede nasîn. Herwehajî Nasîna Welatperwerîyê sînorekî kêm ji Yekitiya Welatî nala wênekirina wêna dide divakirin".

"Pir bi dujwari ve dê bête dîtin, heger ku Merov Nasînê ji bona Wekhevbûneke sade yanjî ji bona Wêneyekî bi tenha xwe ve yanjî ji bona Bawermendiyekê bide vegerandin".

Li paş de Nivîsan hin Mejûwêni bi derd ve dide bibîrxistin: 1815 (Waterlo)¹, 1871 (Sedan)² û Sala 1940, ya ku ew têde di Cenga Cîhanî Duwem de bi Dîlvan ve ji bona nava

¹Di Şerî Waterlo de Napolion hate şikenadin û Dîlkirin. Cuma.

²Di Şerî Sedan Padîsahî Firensî ji bal Serdarê Lşkerê Elmanî Von Molkte hate Dîlkirin û Tevaya Firensa ji bal Elmanan ve hate layîkirin. Di Sala 1871 de li Kaha Feresay de Yekitiya Tevaya Elmanya di bin Rêberiya Serekwezirê Elmanî Bismark de hate dazîn. Ev Von Molkê der Sala 1834 de nala Efserêkî Elmanî ji bona bi rêk û pekxistina Supahê Turkî ji bona nava Dewleta Osmanî hatibû rékirin.

destêن Elmanan ve hate kevtin û wî çend Sal di Dîlbnâ xwe de li Elmania de date vebuhurandin. Wî li ser vê Dîlbûna xwe de date nivîsandin: "Em Firensa windaker bûn, belam li dû me de Firensa Kûr dihate dîtin".

Di Deryê Bergê Yekemî "Nasîna Fernsa: Cih û Mêjû de" Broadel dide xuyanîkirin, ku çend rengên bikaranîna Ciyoğrafi têtin dîtin. Hinek têtin dîtin, ku ew Ciyoğrafya mîna Zanistiyekê bi serê xwe ve û ligel pêwendiyêن wî ligel Zanistiyêن Serûştiyî din de didin nivîsandin. Evaya bi xwe jî ve Ciyoğrafi didin kirin. Belam Ciyoğrafya ji bona me dê bi rengekî taybetî ve nala rîyekê bête dîtin, da ku em Méja Firnsî di wî warî de bidin xwendin, ezmonkirin û liberxistin, di yê ku ew ji bona me Mêjûvanan de bi giringî ve tête dîtin. Ciyoğrafya jî bi vê ve tête rûniştin. Esman, Firehbûn, Herem û Dîdar nebes bi tenê ve ew bi rastiyêن Niha ve têtin jîyandin, belam ew nala rengan jî têtin jîyandin, yên ku ew ji bal Mêjê ve ... ji bal Zemînê ve hatin histin, mîna ku pistê Mirov bi şopêن birînê kevnar ve dide parastin".

"Debihêlin, ku em bêhnekê xwe bidin jibîrakirin, ku Çemên Rayin û Ron nebes tenê ew Çemên bêdengin, yên ku ew bi vîna Mirov ve hatine baqîkirin û kedikirin, mîna ku em wan di vê Roja hanê didin dîtin. Debihêlin, ku em wan Çemên Hov bidin dîtin, mîna ku ew hebûn, yên ku di nava wan de Gemîkirin bi dujwarî ve dihate dîtin. Tevlivêjî de Bazirganî bi mîrxasî ve bi dujwarîya Şepolêن wan Çeman ve li ser wan de jî hate dîtin. Heger me weha date kirin, dê emê Niha ji bona Mêjê bidin hiştin".

"Hêjabûna Dîtina Ciyoğrafi ew di sitûrbûna Ciyoğrafiya de li ser Dema dirêj û pirbûna rastîyan de tête dîtin, yên ku ew li ser hevdû de hatine komkirin. Ji erkê me tête dîtin, ku em wan ji hev bidin cudakirin û careke din em wan ji nû ve bidin biyekkirin".

Braudel Bergê Yekem ji bona Sê Deryan dide parvekirin. Deryê Yekem ew wî ji bona "Dîtina Bînvaniya Mêjê li ser pirbûna Firensî" dide tirxankirin. Pirbûna wêna bi Pirbûnê ve û hebûna "Welatêن" cudan têde di warêن Cihî de û ji bona her Yekê Xwemoxtarîya wêna dayite tirxankirin, bi têgihistina ku Firensa bes û bi tenha ve komekê ji "Welatêن" cudan bi rengên xwe ve û bi kaşiyêن xwe ve di waran de dide pêkanîn, yên ku ew dê wan di Deryekî de bide ezmonkirin, yê ku wî ew bi "Firensa di Cudabûna xwe de" (cudabûn bi diversité ve) dayite binavkirin.

Belam "Warêن cudanbûyî ligelhevdû de têtin perçîmkirin, heger ku ji wan re pêwistî û divabûn di navbera warekî û yê din de bête peydakirin û hegerjî di navbera wan de nîşan û cudabûnê bi carekê ve û bi veguhestinê ve bêtin peydakirin yanjî bi wan rîyan ve têtin dîtin, yên ku ew her û her bi serhişkî ve "Welatê" Cihî bi Heremê ve, Gundan bi Bajarêن biçûk ve, van jî bi Bajarêن Mezin û Melbendar ve bi laşê Netewe ve didin dirûtin". Jibervêjî ew Deryê Duwem bi: "Rêzanê Neşînvanîya Tûde: Gund, Bajarvanî û Bajar" ve dide binavkirin. Ev Yekîtiyêن hanê dikarin di nava hevdû de di "Komên Fireh" (bi têgihistina Heremên Ciyoğrafi ve) û hevgirtî de bidin komkirin, ji yên ku ji bona her Yekê ji wan taybetîyêن wê di nava Netewe de têtin dîtin.

Wisa Netewe ligel hebûna van "Komên Fireh" de di nava xwe jî de "dîkarîbû ji bona xwe Yekbûneke komkirî bide durustkirin û ew xwe di mayînê de bêde hiştin. Belê Serûştiyâ Banîya wêyî Zemînî (Espou, Raum) ji bona hebûnkirina wêna date alîkarîkirin. Ev Firensa hanê di nava Mala xwe de di Beşekî Ewropî de di nava Cîhanê de hate pêkhatin". Jibervêjî

Wî 64 Name li ser rewş u zînetên Turkî ji bona Hevalê xwe li Elmania date rîkirin. Ji van Nameyan Sê nanejî bes u bi tebnha ve li ser Kurdan dayite nivîsandin. Ew pir bi nerx u buha ve têtin dîtin; ji ber ku ew li tevaya Kurdistanê de hatiye gerandin û wi ew bi çavêن Miroveki dûrbîn û zana dayite nivîsandin. Cuma

wî Deryê Sêyem dayite binavkirin: "Magelo Ciyoğrafya Firensa dayite afirandin?".

Danervan di Deryê Yekem de dide gotin: " Heger ku me bi tûjî ve lêdate temaşekirin, dê emê bidin dîtin, ku Ingilistan¹, Gerministan, Italya û Sipanya jî ji pir rengan têtin pêkhatin, belam rengbûnên Heremên wan dibe, ku ew di jimar û perçîmbûnên xwe de ji yên Firensî kêmtir bêtin dîtin".

Ez Nivistê didim girtin û ez wê bê helbijartineke berê careke din didim vekirin. Çavên min li ser rûpê 83 ji Deryê Yekem têtin kevtin û ez têde navnîşanekê mîna tê ez dibînim: "Zaravayêن Cihî û Navêن Ciyoğrafî di nokerîya Ciyoğrafîya Berî Mêjûwê de"². Ez têde "Zaravayêن Cihî û Navêن Ciyoğrafî didim xwendin, tevî ku ew jî ji me re ji Mêjê ligel veguhertinê peyvdarîya xwe de hatine gihaştin. Hemû bi xwe jî ve ji bona sînorêñ demêñ lidûhevdû de didin nîşandan. Dibe, ku bi hêsanî ve rêk û pêkxistina wanî Demî neyête dîtin; belam ew bi xwe ve bi rastî ve li ser rastîya xweyî niha tête suwarkirin, ku Zimanê Firensî bes û bi tenha ve di Ferensa de taze hatîye belavkirin. Herwehajî veguhertinê peyvdarîyê di van Navan de ew dikarin bêtin xwedekarîkirin; belam ew jî bi xwe jî ve wî tiştî bi xwe jî ve didin derxistin"³

Di vir de "Xizneke giranbuha ji bona nasîna Mêja dûr tête dîtin, ya ku hêjî kûrbûnna wêna ji bal Karnasên Zanistîya Zimanâne nehatîye diyarkirin".

Ez rûpelê 111 ji vê Nivistê (ji Bergê Duwem li ser Tude de) didim vekirin û ez têde didim xwendin: "Neşînvaniya Tude di nava Gundan de bingehê Jînêyî hîmî dide pêkanîn û li ser dubarekirina Rêzanê de tevaya Avanîyê tête rawestandin". Komkirina Gundan nimûneyekî dide derxistin, ku ew hîç bi carekê ve ji Heremekê ji bona ya din nayête veguhertin û ew bê dawîbun tête dubarekirin. Gund xwe di nava bazinan de li dora Bajerokî de didin komkirin, ya ku ew ji wan re Bazarekê dide pêkanîn, mîna ku Sitêr xwe li dora Sitêrkokê de didin komkirin. Komkirina "Gundan li dora Bajerokî de" Malikekê dide pêkanîn, ya ku ew tête dubarekirin. Herwehajî ew Malikên hanê (yanjî Navçe: Ismet Şerif Vanlı) bi xwe jî ve xwe li dora Bajarekî Biçûk de didin komkirin. Ev Malikên hanê ligel Malikê dor û berên xwe de wê didin pêkanîn, ya ku em wê "bi Welatê Cihî ve" didin binavkirin. Ev jî bi xwe jî ve xwe li dora Bajaran didin komkirin, yên ku ew ji wan re Bazarêñ wani Bazirganîyê didin pêkanîn. Bajar û dor û berên xwe bi Rê û Banan ve ligel hevdû de tête girêdan, da ku ew Heremekê bidin durustkirin û ji bona her Heremekê Bazara wêyî Ciyoğrafî tête dîtin. Belam dan û sitendina Hereman ligel hevdû de ji bona afirandina "Bazara Welatî" bes û bi tenha ve di demeke dereng de hate kirin.

Li ji aliyekekî din di (Rûpelê 121) tête gotin: "ku her Gundek û bi Cihê xwe ve nala

¹Firensî gotina "Ingilistanê" ne bes bi tenê ve bi têgihiştina "Ingilistanê" ve anglo England didin bikaranîn, lêbelê ew bi têgihiştina "Britain" ji didin bakaranîn, (ya ku ew ji ya pêşî bi firehtir ve tête derkevtin). Ismet Şerif vanlı

²Bi Zimanê Firensî: "La dialectologie et la toponymie au service d'une géographie préhistorique". Ismet Şerif Vanlı

³Nêzika Nivê Tudeyêñ Firensî hêjî bi Zaravayêñ cudayıyî ne Firensiya Nuh tanî deshpêka Sedsalê Nozdchan de dihatin axivtin. Ji van jî "Langue d'Oc" -Zimanê Ok li Jér de û "Franco - Provencak" -fronko-Provensak li Jérî Rojhilat (û li Jorî Italya de û nemaze li Herema Torino û Osta de û li hin Heremên Siwêrsa Firensî de)têtin dîtin. Ev herdu Ziman jî ji bona Binemala "Romaniyî Gali" mîna Firensiya Nuh, (ya ku ew li Herema Parîsê de hate bipêşvekevtin), têtin gihaştin. Herwehajî jî Zimanê Breton tête dîtin, ya ku ew ji bona Binemala "Selçiyî" Galiyi kevnar tête gihaştin. Herwejî ji van Zimanâne jî Paski li nêzika Çiyayêñ Prinêni de, Filamendi li nêzika sînorêñ Belçikiyî Rojava de û Gerministanî di Heremên Ilzas û Lorîn têtin dîtin. Ismet Şerif vanlı

Malikeke Biyologî tête derkevtin, ya ku ew rê bi Neşînvanîyê û Berkirinê ve dide dan".

Ez Rûpelê 127 ji xwe re didim vekirin û ez ji xwe re di nava wî de vê Navnîşana hanê didim dîtin: "Daristan: Kulîlka Bêran". Ez têde didim xwendin: "Me tanî vê Roja meyi Niha jî nedida zanîn, bê ka Daristanê çi hêjabûneke Aburî dide wênerîkirin. Min di jor de rola wêna ji bona xwedikirina Terş de date diyarkirin. Pelên Darêñ Berûwan û Dirdaran ji bona êmê Cengelan dihatin civandin, gava ku Giya ji bona wan dihatin kêmkirin. Pelên Narewanan ji bona dagirtina Livînan û sergokorina Erdêñ Çandinîyê didan bikaranîn. Herwehajî Daristanê Darêñ sûtandinê ji bona Pijîna xwarinê, Germkirina Xaniyan, hîtkirina Lajwerdan, Çêkirina Hesingeriyê, Avceh, Elkuhul û Caman dida pêşkeşkirin. Herwehajî wê Kel û Pelên Xav ji bona Çêkirina Depan, Haletan, Ereban, Qapqapkan û Destikêñ Cuda û ji bona avakirina Xaniyan, Gemîyan û Qeyikan û herwehajî ji bona pir Aletêñ din jî mîna Givaştinan, Tirumpe, Qerasan û Çerxêñ bi diranêñ di nava hevdû de dida pêşkeşkirin".

Balam Daristan bi xwe jî ve "Cîhanêke Servaje". (Ev Navnîşana Rûpelê 128 bû). Ango: "Ku ew nala Buhuştâ Rêbiran û Keleşan dihate dîtin". Pir ji Daristan ji ber vî hoyê hanê ve hêjî cihê metîrsîyê têtin dîtin.

Di Deryê Sêyem de tête dîtin, (magelo Ciyoğrafya Firensa dayite afirandin?) Danervan bersiveke bi carekê ve li ser vê pirsa hanê de nade dan, belam ew cihê wêna di alîyê Rojavayî Hişkîya Ewropî de di navbera Ziryanê Atlesî û Derya Sipî, Derya Jorî u Çemê Rayin de dide berzkirin. – Ew dide pirskirin: Magelo bi rasî jî ve Ewropa nala Hişkayetîyekê ve tête derkevtin, yanjî ku ew nala dirêjbûnekê ji Perçeyê Hişkatîya Asyayî tête derkevtin? Ew giringbûna (isthme, Isthmus, ew Tengavîyeke Zemenî ye, ya ku ew di navbera Du Deryan de tête dîtin) Banê di navbera Atlantik û Derya Sipî de dide berzkirin û herwehajî ew giringbûna Deşta Çemê Ron jî û pêwendîya wêna bi Cihokekê ve ligel Çemê Rayin ji dide berzkirin. Ew ji xwe jî dide pirskirin: Magelo çîma Deşta Parisê bi Navîniya Firensa ve û ma çîma jî Paris bi Navîniya Firensa ve hate kirin?". Herwehajî ew pirsa Sînorê Rojhilatî ligel Germinstanê (Çemê Rayin) de dide kirin. Herwehajî ew dide pirsîn: Magelo "Sînorêñ Serûştî jî têtin dîtin"?

Braudel di Beşê Duwemî vê Zincîra hanê "Nasîna Firensa: Mirov û Tiş" di Sala 1968 de di Bergan de date belavkirin¹. Wî Beşê Yekem jê "Merov" ango Neşînvanî li ser Zemîna Firensî de ji Heyamên Berî Mêjûyê de ji Heremekê ji bona Herema din de û herwehajî derkevtina Çandinyê, Gundan û Xwedîkirina Terş û Barvekirinê cudan, yên ku ew ji bona ser Zemîna wê de di Heyamên cudan de hatin hatin dîtin, date tirxankirin. Herwehajî wî têde pêşvekevtina Tudayan û bêtirbûna wanen (ji ber hoyêñ Derveyî mîna Barkirinan yanjî hoyêñ Hundurû mîna pêşkevtin û bêtirbûna Destikêñ Berkirinê date derxistin. Herwehajî wî kembûna Tude (ji ber hoyêñ Cengan, yanjî Nexweşî û Halan) date derxistin. Wî Bergê Duwem jê "Tiş" ango Aburî û Berkirin û bi taybetî ve ji bona Aburîya Çandinyê date tirxankirin.

Heger ku Bergê Yekem jê, yên ku me ew nala "Nasîna Firensa: Cih û Mêjû" date dîtin, ew ji me re "Pirbûna" Welêt di warê Mêjûyî û Ciyoğrafî de tanî vê Serdema me dide derxistin, Xwendina Bergê Yekem ji Beşê Duwem ji bona ber çavêñ Xwendevan rengêñ cuda ji Tudan dide danîn, yên ku ew di nava derbasbûna Heyaman de li dûhevdû de ji bona nava Welêt hatine kevtin, yanjî mîna ku ew dide gotin: "Pir Firensa li dûhevdû de" cuda û mîna

¹F. Braudel: "L'identité de la france: les hommes et les chose", Paris 1986. Bergê Yekem jê di 243 Rûpelan de û Bergê Duwem jê di 536 Rûpelan de têtin ditin. Ismet Şerif Vanlı

hev di hergav de hatine dîtin û ji vê tevlihevbûna wê de ji kevnar û niha de Miletê Firensiyî niha hatîye derkevtin. Dibe, ku bi başî ve biçekî jî bête dîtin, ku Merov bêhnekê xwe li bal vî Bergê hanê de bide rawestandin.

Braudel bi agehdariya Xwendevan dide destpêkirin: " Mede gotin, ku Préhistoire – Berî Mêjûwê ne ji Mêjûwê tête dîtin". "Welatê Galî dihate dîtin, berî ku ew bi Welatê galî ve bête binavkirin", (yê ku ew ji bal Qeyser Serdarê Romanî hate vekirin, mîna ku mîna me ew di Sedsalê Yekemî Pêş Zayînê de date dîtin). "Firensa jî berî Firensa dihate dîtin". Bi serdejî ve wergirtinê Firensa ji Mayînê Welatê Galî Merov nikare li ber Mêjûwa wê de bête kevtin, "heger Merov li Mêjê de bi çavekî rast û durust nede temaşekirin, ya ku ew li pêşya Vekirina Romanî bi jimara Hezaran Sal ve tête derkevtin". Ev jî ber "ku komikên mezîni ji Dema Mêj de, yên ku Mirov di nava wan de hatîye jîyandin, ji bona me têtin gihaŞtin, ku Mirov nikare Mêjû ji Berî Mêjûwê bide cudakirin".

Danervan li ser nuhbûna "Zanistîya Berî Mêjûwê" de pir tête liberkevtin û ew di Payînê de bes û bi tenha ve dikare tanî niha Mêja kevnarı kûr bi rengekî nêzîkî ve bide ronahîkirin. Li gora agehdariyên meyî niha de Bavpîrê Mirovê Pêşî "Momo habilis" bû, yê ku ew di Pêşî de li Afrika de hatîye derkevtin. Wî dikarîbû xwe li ser lingên xwe de bide girtin, destêن xwe bide bakaranîn û jê re bîrwerî û hestî dihate dîtin. Li paş de "Homo erectus" – Mirovê Rabûyî şûna wî date girtin, yê ku ew li ser lingên xwe de dihate birêkevtin û ew dihate axivtin. Şopêن wî di Rojhilata Navînî û Ewropa de û jêjî di Firensa de têtin dîtin. Şopêن wî di Ferensa de ji bona nêzîka Yek Melyon û Heştsed Hezar Sal têtin vegerandin. Bi rastî ve Şopêن ji bona nêzîka Nehsedûpêncî Hezar Sal têtin vegerandin, mîna ku wan Şopêن xwe di Şikevta Jorî Bajarê Nice de di Herema Çiyayêن Alpî Deryayî de dane hiştin. Di nêzîka Sed Hezar Sal de di Berî Zayînê de "Homos Sapiens" cihê "Mirovê Rabûyî" ji xwe re date girtin. Ew herwehajî bi "Mirovê Neaderthal" jî ve dihate binavkirin. Wî Mirîyêن xwe didan veşartin. Mirove niha "Homo Sapiens Sapiens" di Deverêن cudan de û di Ewropa de di nêzîka Sêsedûpêncî Hezar Sal Berî Zayînê de hatîye dîtin. Wî Nigarî û Neqîskirina ser beran dida zanîn, Hesteke wiyî Oldarî dihate dîtin. Wî ji me re Nigar li Firensa de di Şikevta Lascause, Cro-Magnon – Lasko û kro-Mangon û yên din de li dû xwe de dane hiştin, yên ku ew ji bona navbera Sî û Deh Hezar Sal Berî Zayînê têtin vegerandin. Xwedîkirina Terş û Destpêkiran Çandinîyê di nava Firensa û Perçeyên dinî Ewropa de bihatina ji Rojhilat di nava Du Rêyan de hatine peydakirin: Di Jêrî Firensa de ew di Rêya Derya Sipî de ji destpêka Hezar Salê Pêncehemînî Berî Zayînê de bi alîkariya Bazirganîyê ve hatine peydakirin. Li Jorî wê de ew li paş nêzîka Pênc Sedsalan jê bi alîkariya Deşta Çemê Danop û Barkirinê ve hatine peydakirin. Bi destpêkirina Çandinîyê ve Amrazên Çandinîyê û Çêkirina Qafikan dayite destpêkjirin. Mirov dest bi rûniştinê ve dayite kirin. (Çandinîyê û Xwedîkirina Terş di Kurdistanê de ji nêzîka Deh Hezarê Berî Zayînê de dayite destpêkirin. Li paş de Gemîkirinê di Derya Ice de dayite destpêkirin).

Danervan dide dîtin, ku ewropa bes û bi tenha ve nala dirêjbûneke biçûk ji bona Perçeyê Asyayî mezin tête derkevtin û ew her bêtir ber bi Rojava ve tête tengkirin. Firensa tevî bi firehbûna xwe ve bes û bi tenha ve ew nala payîna tengbûna Ewropa beramber bi Ziryana Atlesî ve tête derkevtin û ew bi pesinandina xweyî Ciyoğrafî ve her û her nala hêvîbûnê dihate derkevtin, ya ku di nava wê de Barkirin û Hêrişêن derbasbûyî di nava Ewropa Rojhilatî û Navînî de dihatin payînkirin. Herwehajî Firensa bi saya Kenarê xwe ve li ser Derya Sipî de her û her ew ligel Deşta vê Derya hanê de dihate pêwendîkirin. Ji vê hate encamkirin, ku Firensa ji kevnar de bi xwedan Tudeyên tevlihev ve dihate derkevtin. Em têde rengên Interpologiyyî Ewropiyî Sê Qolî didin dîtin: (Nordique – Jorîyî Serdirêj, Alpiyî – Sergundor û Jêrî, mîna ku ew di Deşta Derya Sipî de tête dîtin). Herwehajî pesinandina wênayî Ciyoğrafî û başbûna Av û Bayê wêna jê re mercen pêwist ji bona pêşvexistina

Çandinîyê û bêtirkirina Serjimara Tude datin amadekirin.

Ji bona Ewropa û herwehajî ji bona Firensa Çêkirina Lajwerdan ji Asya Rojava de bi wan ve hate gihaştin: Pêla Misê di navbera Salên 2500 û 1800 Berî Zayînê de hatîye dîtin, Pêla Tûncê di navbera Salên 1800 û 700 Berî Zayînê de hatîye dîtin û Pêla Hesinî û pêrejî Hesp ji vê Mêjûwê de ji Sala 700 Berî Zayînê de tête dîtin. Çêkirina Tûncê anîna Lajwerda Perçekê ji Ingilistanê de date pêwistkirin.

Gund li ser kenarêن Çeman de hatin belavkirin. Bi birîna darêن Daristanan ve di navbera destpêkirina Sê Hezar Salî û Sala 1800 Berî Zayînê de Karnas Serjimara Firensa di vê Mêjûwa hanê de, (Danervan bi wan ve dide bîvanîkirin), di navbera 2,5 tanî 5 (Pênc) Milyon Kes didin danin.

Di pêla Sala 1200 tanî 100 Berî Zayînê de Barkirinênuh ji bona Firensa di rîya Çemê Rayin de hatin kîrin. Hatinvan, (em tutîşti li ser wan de nadin nasîn), ji Tudeyêñ kevnar dihatin cudakirin; ji ber ku wan Termêñ Mirîyêñ xwe didatin sûtandin. Ew ligel Pêşîyan de hatin tevlihevkirin. Ji vê pêşvekevtina Çandinyê hate encamkirin.

Di nava Sedsalên Heft û Şeşemînî Berî Zayînê de Bazirganî di navbera Firensa Jêri û Welatê Derya Sipî de hate firehkirin. Di nava Welatê Derya Sipî de Bajarêñ xwedan Bedenêñ sengîn hatin derkevtin. Ji van jî Massalia (Mersilya) hate derkevtin, ya ku ew ji bal Bazirganêñ Yunanî ve di nêzika 600 Salên Berî Zayînê de hatîye avakirin. Herwehajî Koman ji Etrusqus (ji Italya) di nava Çiyayêñ Alp re ji bona Firensan di vê pêlê de bi destpêkirina barkirina xwe ve dane kîrin.

Pêlên Berî Mêjûwê li Firensa de li gora bîr û bawerîya Danervan de ligel Koçkirinêñ Miletê Galî de ji bona wê bi jimarêñ gewre ve di Sedsalê Pêncemînî Berî Zayînê de¹ di derbasbûna Çemê Rayin de hatine bidawîkirin. Ew ji bona wê ji Ewropa Navînî û nemaze ji Bavarya li Gerministanê de û ji Bohêmya (li Çikoslovakya de) hatin. Galî bi Zimanê Yunanîyî kevnar ve bi "Kaltoi" ve dihatin binavkirin. Ew bi Zimanekî Hindo-Ewropî ve didan axivtin. Miltêñ Hindo-Ewropî di wê gavê de ji Firensa tanî Deşta Çemê Gang li Hindê de dihatin belavkirin. Hegerjî Ev Miletêñ hanê jî "bi Zimanêñ Nêzîkî hev ve jî dihatina axivtin, mîna ku Danervan dide dîtin; belam ew Miletan di warê Resenî û Interpologî de bi cudabûn ve daihatin derkevtin.

Belam Galî bi xwe ve "di warê Rehitîya xwe de Miletêñ tevlihev ligora dîtinêñ Iteropologîyan digatin derkevtin. Hinek ji wan Dolichocéphles (Serdirêj) û hinêñ din ji wan Brachycéphles (Serdestari) dihatin dîtin.

Germanî di wê gavê de li ser Rexêñ Derya Baltik (ango Jorî Welatê Siltîyêñ Pêşî) de dihatin jîyandin, di dema ku Slaves -Silavî di Rojhilat de dihatin jîyandin. Siltî ji Germananû Silavîyan bêtir bi Bajarvanî ve dihatin dîtin, ji ber ku ew ji Navînîya Bajarîyê bi nêziktir ve dihatin dîtin.

Em tu li ser hoyêñ Barkirinê yanjî Hêrisêñ wan Siltîyan de nizanin. Barkirinê wan ji dawîya Sedsalê Şeşemînî Berî Zayînê de ji Jor de dayite destpêkirin. Di payîna Sedsalê lidûhatî de ew bi Xwedanê Welêt ve hatin kîrin. Wan piraniya Tudayêñ Pêşîyi Welêt di nava

¹ Wer tête dîtin, ku Payînbûna "Berî Mêjûwê" û destpêkirina Pêlên Mêjûyî, (yêñ ku ew beramber bi yêñ berî xwe ve tête nîşankirin, ku em wan bi rengekî hûrtîr ve didin nasîn; ev jî bi saya destpêkirina Nivîsandînê tête dîtin). Nivîsandînê li Mizopotamya de di Pêşîya Hezar Salê Sêyemê Berî Zayînê de diyite destpêkirin, angó wê berî Ewropa bi nêzika Bîstûpênc Sedsalan ve dayite destpêkirin. Ismet Serif Vanlı

xwe de datin mijandin û Zimanê Siltî bi Zimanê Firensa ve hate kirin¹.

Hinek ji Siltîyan li ser rêya xwe de ji bona Sipanya hatin çûyîn. Beşekî din ji wan ji bona Welatê Galî Birîtanî, Sikotlanda û Irlanda hatin çûyîn. Herwehajî Beşekî din ji wan ji Bavarya ji bona Jorî Italia di Rêya Gelîyê Brenner de hatin çûyîn û ew li Herema Çemê Po (Devera Milano) hatin neşînîkirin. Belam wan Roma di Sala 386 Berî Zayînê de dane layînkirin. Der Sala 230 Berî Zayînê de Beşekî din ji Galîyan ji bona navan Ewropa Navînî û Asya Biçûk (Turkî) dane barkirin. Wan li wêderê de Padîşahîya Galate –Galatî dane damezirandin. Hinek ji wan jî di Belkan de hatin daniştin. (Herwehajî em dizanin, ku Welatê Galîyî –nuh– Siwêrsa û Belgiyen jî dida wergirtin. Wan ev Welatên hanê hemû bi darêن çô ve dabûn vekirin.

¹Bi pirbûn ve ji bona Firensa tu Yekitîyeke Zimanî berî Barkirinê Siltîyan nedihate dîtin. Dibe, ku piranîya Tudeyên wêna bi Zimanekî ji Malbata "ibérique" –Ibirî (mîna li Sipanya û Ingilistanê de) dihatin axivtin. Hêjî tanî vê Rojê jî ji bona vî Zimanê hanê Zimanê Bask tê gjîastin. Ismet Şerif Vanlı